



Li Almanyanayê Dibistan û Perwerdehî



Rêbernameyek ji bo dê û bavên koçber û yên ku nû hatine Almanyanê

Bi alîkariya:



Die Beauftragte der Bundesregierung
für Migration, Flüchtlinge und
Integration

Weşandin ji aliyê:

**Ethno-
Medizinisches
Zentrum e.V.**



Impressum

MiMi – Schule und Bildung

Herausgeber:

Ethno-Medizinisches Zentrum e.V.
Königstraße 6, 30175 Hannover

Konzeption, Inhalt, Erstellung:

Duale Hochschule Baden-Württemberg
Villingen-Schwenningen (DHBW) – Institut für Transkulturelle Gesundheitsforschung
Ethno-Medizinisches Zentrum e.V. (EMZ e.V.) – MiMi Integrationslabor Berlin

Förderung: Beauftragte der Bundesregierung für Migration, Flüchtlinge und Integration

Projektleitung: Ramazan Salman (EMZ e.V.), Prof. Dr. Dr. Jan Ilhan Kizilhan (DHBW)

Redaktion: Claudia Klett (DHBW), Anne Rosenberg (Projektkoordinatorin), Anette Metzger, Ramazan Salman, Soner Tuna, Ali Türk, Dr. Dursun Tan, Mustafa Yalcinkaya, Lütfi Salman, Miray Salman, Lajos Fischer, Bernd Neubauer, Prof. Dr. Jan Ilhan Kizilhan

Layout und Satz: eindruck.net, 30175 Hannover

Illustrationen: deanhills.com, 55130 Mainz

Übersetzung: Dolmetscherdienst – Ethno-Medizinisches Zentrum e.V.

Alle Rechte vorbehalten. Das Werk ist urheberrechtlich geschützt. Jede Verwendung in anderen als den gesetzlich zugelassenen Fällen bedarf deshalb der vorherigen schriftlichen Genehmigung durch den Herausgeber.

Diese Publikation können Sie jederzeit über die Webseiten „www.mimi-gegen-gewalt.de“ oder „www.bildung-und-schule.info“ in folgenden Sprachen anfordern:

Arabisch, Deutsch, Englisch, Farsi, Französisch, Italienisch, Kurdisch, Polnisch, Rumänisch, Russisch, Serbisch/Bosnisch/Kroatisch, Spanisch und Türkisch.

1. Auflage · Stand: Dezember 2021

Nivîs bi zimanekî sade hatiye nivîsandin. Ew, -xên ji çend îstîsnayan- rêgezên Tora Ziman ya Hêsan bingeh digire.

Ji ber bikaranîna zimanekî sade, di vê nivîsê da, rastnivîsîna li gor zayendê, nayê bikaranîn. Hemû binavkirinên şexsî, ji bo hemû zayendan wek hev derbas dibin. Kurtenivîsa ziman, bi tenê ji ber sedemên redaksiyonê ye û nîrxek tê da tune.

Destpêk

Dê û bav û welîyên hêja,

Di jîyana zarok û ciwanan da, dema dibistanê, demeke girîng e. Ew zarokan ji bo jîyana wana perwerde dike. Ev tê wê wateyê, ku ji bo jîyana pêşerojê jî, ezmûnên li dibistanê girîng in. Ji ber vê yekê, di vê demê da, pêdivîya zarok û ciwanan bi piştgirtîyek taybetî heye.

Ev rêbername, di derbarê dibistan û perwerdehîyê li Almanyayê da, li ser bingeha qanûnî nêrînek giştî dide we.

Hûnê sîstema dibistana Almanî nas bikin: Cûreyên dibistanan, zanyarîyên perwerdehî û şhadeyên qedandina dibistanê.

Dema ku zarokên we diçin dibistanê an perwerdehîya pîşeyî, wekî dê û bav an welî, hûn pê agahdar dibin, ku çi pêwîst e, bala xwe bidin ser.

Da ku zarokên we, destpêkeka baş li dibistanê an jî perwerdehîya pîşeyî bikin, hûnê pêşniyaran werbigrin.

Ger di derbarê destpêkirina dibistanê an jî dema dibistanê da, pirsên we yên şexsî hebin, axaftinek şewirmendîyê, pir alîkarî dike. Armanca vê rêbernameyê, ne ev e, ku şûna danûstendinek şexsî bigre. Armanca ew e, ku ji bo xêra zarokên we, li ser dibistan û perwerdehîya li Almanyayê, agahdarîya bingehîn bide we.

Pêşniyarên şewirmendîyê bikar bînin. Bi şewirmendên li herêma xwe ra bipeyivin.

1. Bingehên Yasayî

Li Almanayê destûra kê heye ku biçin dibistanê?

Xwegihandina perwerdehî mafekî însanî ye. Ev tê wê wateyê, ku mafê her kesî heye ku biçin dibistanê. Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî a sala 1948an, vê yekê wusa dîyar dike: **Mafê hemû kesan bi perwerdehîyê heye.** Ne girîng e, ew jî ku derê tî. An jî li ku dimînin. Ev li Almanayê jî derbas dibe.

Ma pêwist e, ku zarok biçin dibistanê?

Belê. Li Almanayê **erka dibistanî** heye. Ev tê wê wateyê ku divê zarok biçin dibistanê. Ev erk, jî bo hemû zarokên li Almanayê derbas dibe. Ew, jî bo kur û keçan, wekhev tê sepandin.

Bi gelemperî, jî bo zarokên koçber, yê ku destûra wan ya rûniştandinê heye, gava ku ew destpêkê ji sazîya pêşwazîya derdikevin, erka dibistanî dest pêdike. Ev rewş herî dereng piştî 3 mehan pêk tê.

Cîhên pêşwazîya yekem cihek e, ku koçber piştî hatina welêt, cara ewil lê cîbicî dibin.

Mafê zarokan heye ku biçin dibistanê. Pêwendîya wê mafê, bi destûra rûniştandinê ra nîn e.

Erka dibistanî li Almanayê, bi gelemperî **12 salan** dewam dike. Ew, xwe bi **erka dibistana temam rojê û erka dibistana pişeyî**, ku wekî dibistana erka dibistana nîv-rojê jî tê zanîn, girêdide. Di rewşên awarte da, erka dibistanî dikare bête kurt kirin.

Erka dibistanî ya bi temam rojê

Erka dibistana bi temam rojê, bi qeydkirina dibistanê dest pêdike. Ev bi gelemperî dora **6 salan** berdewam dike. Piştî 9 an jî 10 salên bi xwendinê bi dawî tê. Ev li gorî eyaletan diguhere. Wê demê, temenê ciwanan bi gelemperî **15 an 16 salî** ne.

Erka dibistanî ya pîşeyî

Ciwanên ku piştî sinifa 9an, an jî 10an, dest bi **şagirtîyê** dikin, divê bi awayeke rêkûpêk beşdarî dersên **dibistana pîşeyî** bibin. Ji bo wan, **erka dibistanî ya pîşeyî** derbas dibe. Ev bi gelemperî **3 sal** berdewam dike û **şhadeya pîşeyî** bi dawî tê.

Dibistana pîşeyî bi gelemperî heftê carekê an jî salê çend hefte li pey hev pêk tê. Ev bi cureyê perwerdehiya pîşeyî ra girêdayî ye. Ciwan di dema mayî da jî, di şirîka xwe ya perwerdehiyê da hînê xebatên pratîk dibin.

Ciwanên ku diçin dibistaneke din, erka dibistanî ya pîşeyî ji bo wan derbas nabe. Wek mînak, dibistanên din ev in: Lîse, dibistanek pîşeyî yê bilind an jî zanîngehek. Lê ew tişt, ji bo van xwendekaran jî derbas dibe: Tenê piştî 12 salan erka dibistanî bi dawî tê.

Pêwîst e ku hin ciwan, beşdarî **dewreyên amadekirina pîşeyî** yê li dibistanên pîşeyî bibin. Ev ji bo wan ciwanên derbas dibe:

- nikarin dest bi perwerdehiya pîşeyî bikin,
- neçin dibistanek din,
- hîn negihîştine temenekî diyar.

Li Almanyayê, hemû zarok û ciwan, xwedî mafê perwerdebûnê ne. Erka dibistanî, ji bo zarokên temen ji 6 salî dest pêdike. Çûna dibistanê belaş e.

Perwerdehî, ji bo jîyaneke çalak ya di nava civakê da, şertekî girîng e. Di dibistanê da, zarok û ciwan fêrî Almanî dibin. Her weha ewana, ji bo pîşeyek pêşerojê agahdarîyên bingehên fêr dibin. Ji bo ciwanan, dibistan cîheke pir girîng e. Li wir, bi hevra serpêhatîyan parve dikin. Dibistan di jîyana rojane da piştgirî dide zarokan. Bi taybetî ev yeka, ji bo zarokên ku nû hatine Almanyayê, girîng e.

2. Li Almanyayê kîjan cûre dibistan û kîjan zanyarîyên perwerdehîyê heye?

Sîstema dibistanên Almaniya, li ser 3 astan dabeş dibe: Asta Seretayî, Asta Navîn I û Asta Navîn II. Di her astek da, cûreyên sîstema dibistanê yê xwedî zanyarîyên cuda hene. Zanyarîya perwerdehîyê tê wateya perwerdehîya dibistanê ku dibe sedema şehadeyek taybetî ya qedandina dibistanê.

Li Almanyayê her eyalet, perwerdehîya dibistanê bi serê xwe birêva dibe. Ji ber vê yekê, dibe ku di hîn eyaletan da, binavkirin an rêzîknameyên cûda hebin.

Dibistana Seretayî (Asta Seretayî) – bi gelemperî temen ji 6 heta 10 salan

Ji dibistana seretayî ra asta seretayî jî tê gotin (asta sereke: pêşîn).

Hemû zarok, di temen 4 salî da dest bi **dibistana seretayî** dikin. Ew, li eyaletên Berlîn û Brandenbûrgê, ji temen 6 salî dest pêdike.

Di dibistana seretayî da bi hevra fêrbûn, tevgera civakî xurt dike. Tevgera civakî diyar dike, ku mirov bi çî awayî bi hevra danûstendina bikin. Ji bo ku dibistanê bi serketî bi dawî bînin, divê ji bo hemû zarokan, bi qasî ku pêkan e, derfetên wekhev hebin.

Dê û bav nîkarin ji bo zarokê xwe dibistana seretayî li gor dilê xwe hilbijêrin. Bi gelemperî ji bo zarokan, bi qasî ku pêkan be, di dibistana seretayî da cihek tê destnîşankirin. Dibistan, li gor derfetê, nêzikê mala dê û bav be.

Di dibistana seretayî da zarok, hejmaran, xwendin û nivîsandinê hîndibin. Ew, di heman demê da zanyarîyên bingehîn yê din jî hîndibin. Wek mînak, li ser xweza û dîroka herêma ku lê dijîn.

Şîyanên pratîkî jî têtê hînkirin. Mînak: Di trafikê da mirov çawa tevdi gere. An jî avjenî.

Zarok, di sinifê da jî şîyanên civakî hîndibin. Ev ji wan ra dibe alîkar, ku bi kesên din ra danûstendinan bikin.

Asta Navîn (Sekundarstufe I) – bi gelemperî temen ji 10 heta 16 salan

Ji asta navîn ra, Sekundarstufe I jî tê gotin. (Sekundar, tê vê wateya: rêza duwemîn).

Ji bo asta navîn, zanyarîyên perwerdehî ya cûda hene. Zanyarî, li gorî berjewendî û şîyanên xwendekaran hatine lihevanîn.

Her 3 zanyarîyên perwerdehî ya bingehîn ev in:

- Dibistana Seretayî (Haupt-Schule)
- Dibistana Navîn (Real-Schule)
- Lîse (Gymnasium)

Ew zanyarîyên perwerdehîyê, di her eyalêtên federal da, bi cureyên cuda yê dibistanê tên dayîn.

Hîn sîstema dibistanan hene, ku her yek di zanyarîyek perwerdehîyê da pispore in. Mînak: Haupt-Schule (an jî Mittel-Schule), Real-Schule, Lîse (Gymnasium).

Hîn sîstema dibistanan hene, ku her du zanyarîyên perwerdehîyê birêva dibin: Haupt-Schule û Real-Schule. Mînak: dibistanên Werk-Real li Baden-Württemberg.

Û sîstema dibistanan hene, ku her 3 zanyarîyên perwerdehîyê birêva dibin: Wek mînak: Gesamt-Schule, Gemeinschafts-Schule, Ober-Schule, Stadtteil-Schule.

Di destpêkê da xwendekar, li van dibistanan bi hevra tên perwerdekirin. Piştê zanyarîyên perwerdehîyê, dabeşkirin tê. An jî bi tenê, di hinek beşan da.

Ji ber vê yekê, di van dibistanan da, ji bo hîlbijartina şahedeya bi dawî anîna dibistanê, zêdetir dem heye. Xwendekar li vir, bi pêşniyarên taybetî tene piştgirî kirin. Bi taybetî, bi hevra danûstendin û fêrbûna civakî, girîng e.

Zanyariya perwerdehiyê ya Haupt-Schule (Dibistana Navîn)

Di zanyariya perwerdehiyê ya dibistana navîn da, zanîna dibistana seretayî kûrtir dibe. Berî her tiştî, şîyanên pratîk têtê hînkirin.

Armanç ew e, ku ji bo hîlbijartina pişeyî û perwerdehiya pişeyî ya dualî amade bibin. Li Almanyayê gelek pişe, di perwerdehiya pişeyî ya dualî da têtin hînkirin. Dualî têtê vê wateyê, ku 2 cîhên fêrbûnê hene: şîrketên fêrbûna pratîk û dibistana pişeyî.

Di dibistana pişeyî da, zanîna teorîkî têtê hînkirin, yê ku ji bo karûbarê perwerdehiyê girîng in. Li gel van, dersên wekî matematîk, Almanî û Îngilîzî jî têtê hînkirin.

Zanîna perwerdehiyê ya dibistana navîn, bi gelemperî piştî sinifa 9an bi **Şehadeya Dibistana Seretayî I** (Haupt-Schul-Abschluss I) bi dawî têtê. Wê demê, temenên ciwanan, bi piranî dighîje 15 salî.

Di hin eyaletan da, Şehadeya Dibistana Navîn jî cûda têtê binavkirin. Mînak: Pola perwerdehiya pişeyî ya hêsan an bidawî anina dibistana navîn.



Derfetên paşê:

Li dibistana seretayî şhadeya normal, derfet dide ku xwe **bigihînin perwerdehiya pîşeyî ya dualî**.

Şansê bidestxistina cîhekî perwerdehiya şagirtiyê, bi taybetî, di hin pîşeyan da baş in. Ev in:

- Di mekanîkê da pîşe.
Mînak: Mekanîkerên hilberînê
- Di gastronomiyê da pîşe.
Mînak: Pisporê mêvanperweriyê
- Di hilberîn û pîşesaziyê da pîşe.
Mînak: xerat an kuafor
- Di pîşesaziya avakirinê da pîşe.

Kesên ku şhadeyê wan baş in, dikarin beşdarê sala xwendinê ya 10emîn an jî dibistanek pîşeyî bibin. Mînak: **Dibistanek pîşeyî ya teknîkî**.

Dibistanek pîşeyî ya teknîkî (bi kurtî: BFS) dibistanên temam rojê nin. Ji bo dibistana pîşeyî ya teknîkî, pêdivî bi şhadeya dibistana seretayî an jî şhadeya dibistana navîn heye.

Dibistanek pîşeyî ya teknîkî, rêyên perwerdehiyê yê cûda pêşkêş dikin. Mînak: Perwerdehiya pîşeyî ya bingeîn, wergirtina destûrnameya têketina dibistana teknîkî (şhadeya perwerdehiya navîn) an jî şhadeya pîşeyek perwerdehiyê ya pejirandî (dibistan).

Zanyariya Dibistana Navîn

Ciwan, di zanyariya dibistana navîn da, ji zanyariya dibistana seretayî bêtir naveroka teorîk hîn dibin. Naveroka teorîk, bêtir bi fêrkirina ramanê tete bi xurtkirin. Lê xwendekar di heman demê da, di dibistana navîn da hînî şiyane pratîk jî dibin.

Divê, zanyariya perwerdehiya dibistana navîn, xwendekaran ji bo amadekirina perwerdehiya pîşeyî an ji seredana li dibistaneke berdewam bike.

Zanyariya perwerdehiya dibistana navîn, bi gelemperî piştî sinifa 10an bi **şhadeya dibistana navîn** bi dawî tê. Ev şhadeya jî wekî şhadeya dibistana navîn an şhadeya kamilbûna navîn, tete zanîn. Wê demê, temenê ciwanan bi gelemperî dighije 16 salî.

Derfetên paşê:

Şehadeya zanyariya dibistana navîn, derfetê dide, ku hema hema **xwe bighîne hemû pîşeyên perwerdehiya dualî.** Her weha derfeta **perwerdehiya pîşeyî ya li ser bingeha dibistanê** jî dide.



Di hin şert û mercan da, dikare **şehadeya pêştabirî ya dibistana navîn** bête bidestxistin. Mînak: Ger xwendekar xwedî notên baş bin. Paşê ew dikarin biçin **dibistanên berdewamên wî.** Li wir, asta dibistana pîşeyî ya teknîkî, an jî zanîngeha teknîkî ya giştî, dikare bête bidestxistin. Ew şehadeyan, derfet li ber xwendina bilind vedikin.

Zanyariya perwerdehiya lîseyê

Di zanyariya perwerdehiya lîseyê da, herî zêde perwerdehiya naveroka teorîk girîng e. Ji bo zarok û ciwanên ku dixwazin naveroka teorîk bi hêsanî û bi rehetî hîn bibin, tê hedefkirin. Naveroka pratîkî kêmtir girîng e.

Hedef, amadekirina zanîngehê an jî daxwaza perwerdehiya pîşeyî ye.

Li gor eyaletan, zanyariya lîseyê, di asta navîn I da sinifên 5 heta 9an, an heta 10an digre nav xwe. Piştê vê yekê 3 salên din yê dibistanê tên. Ev wek xwendina lîse (Sekundarstufe II) tên binavkirin.




Zanyarîya lîseyê, bi qalîteya **têketina giştî ya zanîngehê** bi dawî tê, pola zanîngeha bilind ya giştî ra, **abitur** tê gotin. Kesên ku abîtur bidest xistine, ji wan ra abîturant dibêjin. Di wê demê da, temenên ciwanan bi gelemperî digihîje 17 û 19 salî.

Derfetên paşê:

Pola zanîngeha bilind ya giştî, mafê dide wan kesan, ku li zanîngehên bilind û zanîngehan bixwînin. Lê belê, piştî zanyarîya lîseyê, dikarin dest bi perwerdehîya pîşeyî jî bikin. Bi gelemperî, abîturantên lîseyê, xwedî derfet in ku perwerdehîya pîşeyî kurt bikin.

Asta Lîseyê (Sekundarstufe II) – bi gelemperî temen ji 16 heta 18 an jî 19 salan

Asta lîseyê (Sekundarstufe II), ciwanên ku zanyarîya lîseyê an jî li dibistanên ku her 3 zanyarîyên perwerdehîyê jî tê da hene, beşdar dibin. Asta lîseyê, ji 3 salên dawî yê dibistanê pêk tê.



Dibistanên ji bo zarok û ciwanên xwedî pêdiviyên taybet

Hin zarokên ku xwedî pêdiviyên taybet an jî astengdar in, dikarin yek ji dibistanên ku li jor hatine diyarkirin, beşdar bibin. Ew, bi pêşniyarên taybetî yê ku li dibistanan têne kirin, piştgirî digrin.

Car caran zarok ji aliyê bedenî an jî ji aliyê derûnî ve, gelek astengdar in. Wê hingê ew nikarin biçin dibistanek asayî ya gelemperî. Mînak: Dema ku zarok nabihîzin û nabînin, rewş wusa ye. An jî ger pirsgerê wan ên pîr mezin ên fêrbûnê hebin. Ji bo van zarokan dibistanên cuda hene. Ewana, pêdiviyên taybetî yê van xwendekaran nas dikin. Sinifên wan ên piçûktir hene. Û mamostayên wan yê xwedî perwerdeyên taybet hene.

Ji bo zarok û ciwanên, ku zimanê Almanî hindik an jî nikarin qet biaxivin, dibistanên cûda tune. Dibistanên ku li jor hatine diyarkirin, li wir, ji bo wan zarokan gelek pêşniyarên din hene. Bi vî awayî dikarin fêrî Almanî bibin.

Pêvajoyên li dibistanê

Çi li dibistanê diqewime, her tim bi awayek rêkûpêk agahdarî didin. Wekî qaîde, mamostayê sinifê, di civînên dê û bavan da, vî karî digire ser xwe. Di civînan da, hemû dê û bav û mamostayê sinifê tèn ba hev. Mamostayê sinifê li ser taybetmendiyên sala xwendinê agahdarîyan dide. Ger hûn li ser pêşketina zarokê xwe li dibistanê bi fikir bin, dikarin bi mamostayê sinifê ra bipeyivin.

Ya girîng ew e, ku di dibistanê Almaniyê da, di navbera kur û keçan da tu cudahî na kirin. Keç û kur bi hevra dersan dibînin. Bi hevra beşdarê dersên sporê û dersên avjenîyê dibin.

Di înternetê da, agahdarîyên li ser babeta dibistanê tèn peydakirin. Mînak: li wir

Li Almaniyê dibistan – niha ez vê fêrî dikim!, li jêr:



www.bpb.de/system/files/dokument/pdf/Schule-in-Deutschland_Ansicht-doppelseitig.pdf

3. Ez çawa dikarin piştgirîya zarokê xwe bikim?

Pêşniyarên cûrbicûr hene, ku hûn dikarin berê destpêka dibistanê û di dema dibistanê da çawa piştgirîyê bidin zarokê xwe.

Pêşniyarên berîya destpêka dibistanê?

Zarok, hê berîya ku dest bi dibistanê bikin, dikarin seredana cîhên cûda yê pêş-dibistanî bikin. Di sîstema perwerdehiya Almanî da, pêş-dibistanî, qada seretayî asta yekem e.

Pêş-dibistanî, ji **cîhên lênêhêrîna zarokan ya rojane, kreş an baxçeyên zarokan pêk tî.** Li wir zarok, bi awayekî dostane tî xwedîkirin. Ji bo lîstinê, ode hene. Ji bo dibistanê piştgirî werdigrin û tî amadekirinê.

Ji bo gelek zarokan, serdan ji bo pêşveçûna wan pir girîng e. Serdana van cîhan, bi dilxwazî ye.

Ji bo mafê mayîne ferq nake, gelo zarok seredanî bi cîhekê dîkin. An jî di malbatê da, li wan tî mêze kirin.

Feydeyên muhtemel ên mêzekirîna zarokan, di nav wan cîhan da ev in:

- Zarok di destên baş da ne. Dê û bav dikarin di vê demê da karên xwe bikin an biçin cem rayedaran. Hûn dikarin zîmanê Almanî fêr bibin an jî biçin kar.
- Zarokên ku bi Almanî nîzanin, dikarin li wir fêr **zîmanê Almanî** bibin.
- Bi zarokên din yê di heman temenî da, hevûdu nas dîkin. Ewana, di hawidoreke dostanî ya zarokan da nin.

Kîjan cîhên lênêhêrîna zarokan, ji bo zaroka min çêtir e?

Weke dê û bav an welî, girîng e ku hûn hedef û pêvajoyên lênihêrîna rojane ya zarokan bizanibin. Bi vî awayî hûn dikarin biryar bidin ka lênêhêrîna rojane ya zarokan ji bo zarokê we û malbata we, çêtir e.

Bi dê û bavên din ra jî, li ser wê bipeyivin.

Hûn dikarin li ser înternetê, materyalê li ser vê yekê bibînin. Mînak:

Vîdeyoyên li ser lênêhêrîna zarokan ya rojane li Almanya. Ew, bi van zimanan hene: Erebi, Almanî, Îngilîzî, Darî/Farisî, Fransî.



www.youtube.com/channel/UCI0FroO4AoHTp8JLM9EUw0g

Pirtûkên bi agahdarîya li ser cîhên lênêhêrîna zarokan ya rojane hene.

Ew, bi van zimanan hene: Erebi, Almanî, Îngilîzî, Farisî, Fransî, Tigrinya.



www.bmfsfj.de/resource/blob/120876/aeb4bd50ba2a811c4d5fb2e0a1a56ef9/herzlich-willkommen-in-unserrer-kita-data.pdf

Her weha hûn dikarin agahdarîyan, ji sazîyan û ji komeleyên dê û bavan ên herêmî jî werbigrin. Bi karmendan ra bipeyivin, her çiqas hûn bi Almanî baş nizandin jî. Her çiqas hûn ji ber sedemên çandî an olî nebawer bin jî, pirsên xwe bikin.

Divê ez çi bikim, da ku zarokê min bikaribe biçe cîhên lênêhêrîna zarokan ya rojane?

Cihê lênihêrînê mafek yasayî ye, ku zarokên temen ji 1 salî mezintir werbigrin. Di paragrafa 24an ya Yasaya Civakî ya Vllan da hatîye dîyar kirin. Ev ji bo zarokên koçber jî derbas dibe, herî dereng dema ku ew ji cîhê pêşwazîya destpêkê derdikevin.

Ji bo lênihêrîna zarokan ya rojane, cihê lênihêrîna şert e. Pêwîst e, ku hûn ji bo cîh, serî lêbidin. Ew çawa tê cîbicî kirin, li her cîh pir cûda ye.

Di derbarê vê yekê da, hûn agahdarîya werbigrin:

- Di rêveberîya heremê, li salona şaredarîyê
- Li Daîra Ciwanan
- Rasterast li cîhên lênêhêrîna zarokan ya rojane

Bi gelemperî, pêşniyarên pêş-
dibistanî, bi dirav in. Ger perê we
têr neke, hûn dikarin ji dayîna
peran, azad bibin. Ji bo vê yekê,
divê hûn serlêdanek pêşkêşî daîra
ciwanan ya berpîrsîyar bikin.
Gelek çaran cihên lînehêrîna
zarokan têra hemû zarokan nakin.
Lê mafê we ya cîhek heye.

Kijan zanyariya perwerdehi ji bo zarokê min çêtir e?

Zanyariya perwerdehiya lîseyê,
derfetên pişeyî yên herî mezin
pêşkêş dike. Lê, her weha,
Şehadeya Dibistana Seretayî
(Haupt-Schul-Abschluss) û
Şehadeya Dibistana Navîn
(Mittlere Schul-Abschluss),

berdewamiya perwerdehiya pişeyî
an dibistanî, derfetên baş pêşkêş
dikin. Gelek şîrke, perwerdehiya
pişeyî ya pratîkî, pir dinirxînin.
Ya girîng ev e, ku biryarek li gorî
şîyanên zarokê we bibe.

Hûn dikarin, ji Daîreya Kar ya
Federal (Bundesagentur für
Arbeit) li ser vê yekê agahdarî û
şewirdariya bê pere werbigirin.
Li jêr:



[www.arbeitsagentur.
de/bildung](http://www.arbeitsagentur.de/bildung)

Ji bo zarokê we, zanyariyek baş, bi lînehêrîna rojane dest pê dike.
Ya girîng ew e, ku zarokê we di dibistanê da xwe rehet hîs bike.
Divê zarokê we baş bikaribe dersan bişopîne.
Divê zarokê we bikaribe şehadeyeka baş, bi dest bixîne.

Ji ber vê yekê, bi zarokê xwe ra tevayî, biryara zanîna perwerdehiyê an jî
dibistana berdewamiya wan bidin!

Piştgirîya zarokê xwe bikin. Lê ji bo pêkanîne, zêde zextê li wan nekin.
Zexta zêde, dikare bibe sedema stresê. Û stres, dikare zarokek nexweş
bibe.

Kî li ser zanîna perwerdehiyê biryar dide?

Ji bo her zarokê, di pêvajoya sinifa dawî da, mamostayên dibistana seretayî, **pêşniyara dibistana seretayî** dinivîsin. Pêşniyar diyar dike, ku li gor zarokê we kîjan zanîna perwerdehiyê herî baş e. Pêşniyar girêdayî not û tevgerên fêrbûnê ye. Mamosta, li ser pêşniyara xwe, bi dê û bav an welîyên qanûnî ra dipeyîvin.

Pêşniyara mamostayan, ne ji bo hemû eyaletan derbas dibe. Her weha hûn dikarin ji bo zarokê xwe, zanîna perwerdehiyeka bilind bixwazin. Piştra dibe ku test, axaftinek şewirmendîyê an jî an dersek ceribandîna pêwîst bike. Ev li gor eyaletan diguhere.

Hûn dikarin li ser vê yekê, yekser, ji dibistana navîn agahdarîyan werbigrin.

Ger li dibistanê pirsgirêka zarokê min hebe, dikarin çî bikim?

Di hînbûnê da zarokê min astengî dikşîne

Di warê hînbûnê da pirsgirêk hebin, di vê babetê da kesê herî girîng yê pêwendîyê **mamosta** ye. Ger gelek babet bandor bibin, bi mamostayê sinifê ra bikevin têkilîyê. Mamosta, dê bi gelemperî kêfxweş bibin ku şîretan li we bikin. Ew şîretan didin we, ka hûn çawa dikarin piştgirîya zarokê xwe bikin. Ji ber vê yekê fedî nekin. Bi mamostayê wan ra bipeyivin, her çiqas hûn bi Almanî baş nizanin jî.



Zaroka min li dersê û him jî li dibistanê, xwe rehet his dike

Di piraniya dibistanan da, cihê **xebatên civakî yên dibistanê** hene. Li wir, pedagogên pisporkar dikin. Pisporkar, ji bo pirsgerêkên şexsî yên zarok û ciwanan, piştgiriyê didin. Hûn an jî zarokê we, dikarin bi pedagogên pisporkar ra randevûyê çêbikin. Bi mamostayan an jî bi xwendekarên din ra pirsgerêk hebin jî, xebatên civakî yên dibistanê, dikare bibe alîkar.

Di gelek dibistanan da, mamostayên şewirmendiyê jî hene. Ew, alîkariya pirsgerêkên gelemperî dikin, her weha bi hîlbijartina rêya perwerdehiyê û pişeyê ra dibin alîkar.



Axaftin nehênî ne. Ev tê wê wateyê, ku di derbarê vê axaftinê da, agahdarî nadin kesên din.

Hejmara telefonan an jî navnîşana e-mailê ya kesên têkildar, bi gelemperî bi rêya malpera dibistanê an jî sekreteryaya dibistanê dikare bête wergirtin.

Zarokê min ne baldar e, xemgîn an jî paşve vekîşîndî ye. Zarokê min zû aciz dibe û êrişkar e

Di vê rewşê da, dibe ku tengahîyek derûnî an nexweşî hebe. Wê hingê zarokê we nikare bi tevahî tevgera xwe bi temamî dîyar bike.

Ji bo teşhîskirina nexweşîyeke derûnî, lênihêrîna bijîşkî pêwîst e. Bi **bijîşkê zarokan** an jî **bijîşkê malbatê** ra randevûyekê çêbikin. Hûnê li wir, di derbarê derfetên şeweya dermankirinê agahdarîyan werbigirin.



4. Em, li Almanyanê nû ne

Kijan sinif, kijan dibistan ji bo zarokê min çêtir e?

Zarok û ciwanên nûhatî, bi gelemperî di sinifa ku li gorî temenê wan, tê bi cih kirin.

Di dema dibistanê da, li welatê ku jê hatine, zanîna perwerdehîyê û cureya dibistanê tê hilbijartin. Car caran zarok û ciwan ji ber revê yan jî ji ber rewşa welatê ku jê hatine, demeke dirêj nîkarin biçin dibistanê. Ev jî li ber çavan tê girtin. Piştra, car caran di sinifa jêrîn da têne cîbicî kirinê.

Pêvajoya rêkûpêk, eyalet bi eyaletan cûda dibe. Berî pejirandinê, di dibistanan an jî di daîreyan da, bi dê û bavan ra axaftin têne kirin.

Gelek caran zarok an jî ciwan, divê pêşî **zimanê Almanî** fêr bibin. Ew dikarin tenê bi vî awayî beşdarê dersê bibin.

Li her eyaletan û li her dibistanan modelên cûda hene:

- Car caran zarok, di sinifa xwe ya normal da, ji bo piştgirîya ziman dersên zêde werdigrin.
- Car caran sinifên cuda yê amadekarîyê hene. Di van sinifan da, zarok û ciwanên ku nû hatine, di destpêkê da bi tevahî an jî bi tenê dersan werdigrin. Bi wî awayî, ji wan ra derfet çêdibe, ku bi lez û bez fêrî zimanê Almanî bibin.

Di dema dest pêkirina dibistanê da, çawa piştgirîya zarokê xwe bikim?

Wekî dê û bav an welî, hûn di jîyana zarokê xwe da mirovên herî girîng in. Ev, bi taybetî ji bo zarokên ku neçar mane, ku welatê xwe û derdorên xwe yê nas biterikînin, derbas dibe.

Bi qaşî ku hûn dikarin, piştgirîya zarokê xwe bikin

Awayên biçûk ji bo vê dibin alîkar. Randeuyên ku hûn bi hevra û bi awayeke rêk û pêk çêdikin, ew in. Mînak: Rojane vexwarina çayê. An jî bi hevra dua xwendin. An jî stran gotin. Ev, girêdayî temenê zarokê we ye.

Zarokê xwe teşwîq bikin, da ku behsa serpehatî û fikirên xwe bike. Bi sebir guhdarî bikin. Her çend zarokê we, xwe dubare bike jî.

Naskirina hawirdora xwe ya nû, ji bo pêşketina zarok û ciwanan girîng e. Da ku pêşwazîyek baş li wan bête kirin: Li taxê, li sinifê, li cîhê listikê.

Ji bo vê yekê, tiştê herî girîng ev e: Bikaribe bi zimanê Almanî biaxife. Û jîyana rojane ya li Almanyayê nas bike. Herdu jî, bi zarokên din ra, yên ku ev demeke dirêj e li Almanyayê dijîn, çêdibe. Tiştê herî hêsan ev e. An jî yên li vir ji dayik bûne.

Ji pêşniyarên dibistanê û cîhên lénêhêrîna zarokan ya rojane, sûd werbigirin

Serdana civîna dê û bavan, civîna şewra dê û bavan û xizmetên şewirmendiyê yên li dibistan û baxçeyên zarokan bikin. Ger hûn Almanî nizanin an jî hindik diaxivin jî. Ev pêşniyar ji bo têkiliyên di navbera mamosta, dê û bav û zarokan da gelekî girîng in.



Di gelek dibistanan da piştî nîvro, ji bo xwendekaran **pêşniyara xizmeta lênihêrîna** zarokan hene. Xwendekar dikarin li wir dersên xwe bikin û bi hevra bileyîzin.

Li gel wan, dibistan **komên xebatê** pêşkêş dikin. Ji wan ra AG tê gotin. Bi gelemperî ewana, ji bo çalakîyên hevbeş, pêşniyarên heftane ne. Mînak: Li koroyê stran gotin, şano lîstin, spor. An boyax kirin û afirandina bi destan. Ev pêşniyar bi dilxwazî ne û li derveyî dersan pêk tên. Destûrê bidin zarokê xwe ku beşdarê van pêşniyaran bibe.

Bi zehmetiyên malbatê ra mirov çawa serederî derdixe?

Di her malbatê da car caran pirsgirêk derdikevin holê. Bi taybetî, di rewşên dijwar da. Bo mînak:


- Ger kesek bêkar be
- Ger li ber destan dirav kêmbê
- Ger di navbera jîn û mêr da pirsgirêk hebin.

Di rewşên wusa da, alîkarîyê bixwazin. Alîkarîyê qebûl bikin. Ji bo fedîkirinê tu sedem tune.

Hûn dikarin li ser înternetê hin pêşniyarên bi zimanê xwe bibînin:



<https://mimi-gegen-gewalt.info-data.info/>



Her weha, dikare rewşa xanî jî dijwar be. Jîyana li cîhê hêwirandina bi hevra an jî li cîhê ewil ya pêşwaziyê, pir caran bi stress e. Di cihekî teng da, endamên malbatê bi hevra gelek wext derbas dikin. Ev, di nav hevjiyandaran û malbatê da dikare bibe sedema stresê.

Çawa dikarim xwe ji stresê dûr bixînim?

- Ji bo xwendin, lîstin, xwarin û razanê, bernameyeke rojane ya demên dîyarkirî çêbikin.
- Planeke heftane çêbikin.
- Da ku hemû bibînin, planê daliqînin.
- Pê bawer bin, ku zarokê we, li gor temenê xwe, li televîzyonê, li ser înternetê an jî li medya civakî, teklîfên gunçaw bi kar tînin.



Perspektîvek bidin zarokê xwe

Perspektîf tê wê wateyê, ku li pêş binêrin. Ew e:

- Zarokê min çî hêvî ji pêşerojê dike?
- Daxwaz û pêdiviyên zarokê min çî ne?

Di malbata xwe da, bi awayeke rêk û pêk li ser van pirsan biaxîfin. Zarokê xwe ciddî bigirin. Her weha zûtirîn bi zarokê xwe ra, li ser xwestekên karîyera wan biaxîfin. Eger hedefek zarokê we hebe, ew dikare bi hêsanîtir û serketî hîn bibe.

Li zarokê xwe binêrin, ka ew çî baş dike. Ji bo vê pesnê wî bidin.

Û her tim bîr binin: Zarok, ji hînbûnê hez dikin. Zarok, hez dikin ku bi ser bikevin. Zarok dixwazin dê û bavên xwe, bextewar û serbilind bikin!

5. Xizmetên şêwirmendîyê yê bi jartî

Babet: Dibistan û Dibistana Pîşeyî

Tora Dê û Bavan ya Federal ya Rêxistinên Koçber ji bo Perwerde û Beşdarbûnê (bbt)

bbt, li ser pirsên baxçê zarokan, dibistan û perwerdeşnîyê, agahdarîyên pîrzmanî dide dê û bavan. Her weha, şîretên online ên pîrzmanî jî mimkun e. www.kebik.de

Şêwirmendîya pîşeyî ya Daîra Kar

Şêwirmendên pîşeyî ya Daîra Kar, sîstema perwerdehiyê ya hemû eyaletan nas dikin. Ew şîret dikin, ka mirov çawa şehadeyaka din ya dibistanê werdigire. Di heman demê da ew dikarin li ser derfetên perwerdehiya dualî an dibistanê, şîretan jî bikin.

Hûn dikarin li vir li ser malperê, ji bo şêwirmendîyek şexsî randevûyêkê çêbikin:

Telefon: 0800 4 555500 (belaş)

Portala agahdarîyê ya online, ji bo meyla pîşeyî û hîlbijartina pîşeyî ya Daîra Kar a Federal

Ev rûpel, di derbarê pîşeyên cûda da agahdarîya zelal peyda dike. Li vir, hûn dikarin bibînin ka li gor we an li gor zarokê we kîjan pîşe bi kêr tê.

Ji bo ciwanan:

[https://planet-beruf.de/
schuelerinnen](https://planet-beruf.de/schuelerinnen)

Ji bo dê û bavan û welîyan:

[https://planet-beruf.de/
eltern-und-erziehungsberechtigte](https://planet-beruf.de/eltern-und-erziehungsberechtigte)

Babeta Alîkarîya Diravî

Pakêta Perwerde û Tevlêbûnê

Malbatên ku pereyên wan hindik in, dikarin ji bo piştgirîya aborî, li pakêta perwerde û beşdarîyê, serî lêdin.

Li gel tiştên din, dikarin ji bo diravan jî serî lebidin:

- Ji bo rêwîtiyên sinifê
- Pêdiviyên dibistanê
- Diravên rêwîtiyê
- Xwarina firavînê

Portala Wezareta Federal ya Malbat, Malniş, Jin û Ciwanan, li ser karûbaran û kesên pêwendîdar ya herêmi, agahdarîyên dide:

<https://familienportal.de/familienportal/familienleistungen/bildung-und-teilhabe>

Dikarin li rêveberîya bajêr an jî li daîreya navçeyê ya cihê rûniştandina we, mirovên pêwendîdar jî bîn dîtin.

Li ser babeta şêwirmendiya derûnî

Navendên şêwirmendiya derûnî ya dibistanê

Ger li dibistanê pirsgirêk hebin, hûn dikarin ji navendên şêwirmendiya derûnî ya dibistanê jî alîkarîyê bixwazin.

Di wan babetan da alîkarîyê didin:

- Dijwarîya xwendinê an jî konsantrasyonê
- Tirs ji îmtîhanan
- Pirsgirêkên bi mamostan ra
- Pirsgirêkên di nav sinifê da

Li xwendekaran şîretan dikin, lê di heman demê da li dê û bav û welîyan jî dikin.

Şêwirmendî bê pere ye û bi erka nepenîtiyê ve girêdayî ye. Ev tê wê wateyê, ku destûra şêwirmendan tune, ku bi kesên din ra, li ser babeta şêwirdarîyê biaxivin.

Dikarin bi awayeke rasterast, bi cihên şêwirmendiyê ra têkilî daynin, di vê babetê da pêdivî tune, ku dibistan bête agahdarkirinê.

Nêrînek li ser cihên şêwirmendiya derûnî yên dibistanan li Almanyayê, li vir dikare bête dîtin: www.schulpsychologie.de

Her wiha li wir, ji bo şêwirmendiya e-mailê jî derfet heye.

Li Almanyanê Dibistan û Perwerdehî

Di vê rêbername da, di derbarê dibistan û perwerdehîya li Almanyanê agahdarî çih digrin. Em dixwazin koçber, penaber û perwerdekarên ku nû hatine, agahdar bikin.

Di malperên me da dikarin broşur bêne siparişkirin an jî versiyonên onlîneyê ji bo smartfon û komputeran dikarin li ser malperên me werin bikar anîn: „www.bildung-und-schule.info“ û „www.mimi-gegen-gewalt.de“

Rêbername di çarçova projeya „MiMi-Pêşîlêgirtina Tundûtûjîyê Bi Koçberan Ra“ hatîye amada kirin û bi gelek zimanan heye.

Das Kooperationsnetzwerk:

**Ethno-
Medizinisches
Zentrum e.V.**



LANDKREIS



Diese Broschüre wird gefördert durch:



Die Beauftragte der Bundesregierung
für Migration, Flüchtlinge und
Integration

Ev rehber tê dan ji hêla: